

Reşîd Hemo simbola neyê jibîrkirin e

Bilal Hesen

Bi dilê xemgîn û derûna
melûl, min nûçeya
koçbûna dawî ya
mamosteyê xwe,
siyasetmedarê çalak û
zîrek, xemxwerê gelê
Kurd Reşîd Hemo bihîst.



Akama vê bûyerê ewqas li min giran e, ji ber ku bi hezaran kîlometran ez dûrî mamosteyê xwe bûme, û nikarim awira dawî lê binêrim.

Tiştê hinekî vê êşa min kêm dike ew e, ku mamoste Reşîd Hemo, tevî ku bi gewdeyê xwe ji nav me barkir, û çûyîna wî bê vegeer e, lê ez û her kesê Kurdê dilzos û wefadar dê di navbera şopên xebata wî, nerîn û boçûnên wî, raman û hizrên wî re, wî bibînin. Ji ber ku ew ne tenê kesekî Kurd bû û hew, belê ew dibistanek e berhemdar bû.

Îro ez bi bîra xwe tînim, çawa Reşîd Hemo di dawîya salên çelî û destpêka salên pênçî yên sedsala bîstem de, li Çiyayê Kurmênc; devera Efrînê, gund bi gund digeriya, û gelek xortên wê demê, ez jî di nav de, hînî xwedî dikirin, û westanê û birçîbûnê û belengaziyê nikarîbûnî riya wî bigirin, û wî ji hînîkirina me xortên wê demê bi dûr de bixînin.

Ew xebata Reşîd Hemo ne ji xwe berê bû, û ne jî bê pîlan û bê armanc bû, belê ez dikarim bibêjim, ewî bi dûrbîniya xwe nifşek ji bo armancine bilind amade dikir, vê lomê ewî ew xortan ne tenê hînî xwedî û nivisandinê dikirin, belê bi ser de jî ewana ji hêla ramanê û hişyariya netewî de jî hînî dikirin, û asowa raman û hizra wan fireh dikir.

Tevî ku ev pîlan û mebesta wî, belkî di destpêkê de, ji gelek kesan û şagirtên wî ve ne

diyar bû jî, lê gava gelek ji wan şagirtan tev li xebata rêzanî û ramyarî kurdî bûn, ew pîlan û mebest sayî û zelal hatin xuyakirin.

Reşîd Hemo bi wê gava giring û hukardar rê li pêş xebata rêzanî durist kir, û vê carê jî ji xebata hînîkirina xwendin û nivisandinê derbas warê ramana civakî û netewî bû, û dîsan gund bi gund geriya û belengazên Kurdên xulmaş şiyar kirin, û kurdayetî bi wan da naskirin, û ta dawîya jiyana xwe dest ji vê xebatê berneda. Ev dûrbîniya Reşîd Hemo ji hemî hevalên wî, damezrênerên yekemîn partiya Kurdî li Sûriyê sala 1957ê ve jî diyar bû. Çimkî gelek ji wan di nivîs û axaftin û bîranînên xwe de çêra bandora wî li ser tozîk û rêbaza wê partiyê kirine, û weha çûne, ku di roja damezrandinê de hinek xalên tozîk û rêbaza partiyê, li gor pêşniyarên wî hatin guhertin.

Reşîd Hemo, bi van çalakiyên xwe, û bi xebata, ku heya roja mirinê domandiye, dikare di dîroka kurdayetiyê de bibe simbolekî neyê jibîrkirin.

Dermanê zivistanê; Pirteqale

Ji ber ku Pirteqal madayek pir vîtamîn C dihevine. Mehên zivistanê hêz û berxwedana beden li hember nexweşiyên ji sermayê tîn û kelijînê diparêze. Taybetiya wê ya teb daxistinê heye.

Hewceye berî mirov nexweş bibe pirteqalan bixwe. Piştî nexweşketinê, pirteqal beşek ji taybetiya xwe ya xweşkirinê winda dike.

Di pirteqalê de ji ber ku pir vîtamîn û fosfor heye, bêhalî û kêmhêziya rehan û hêrsbûnê radike. Pirteqal mîkrobên di nava dev de jî dikûje. Bê pirûzbûn û tazetiya çerm jî pêk tîne.

Bêxwîniya nexweş û zarowan diborîne. Madeyên xisardar yên di nava xwînê de paqij dike. Fêkiyek ji yên herî başe ku pêşiya penceşêrê digire. Heke pirteqal piştî xwarinê bê xwarin, avzêkên aşîkê zêde dike. Givirandinê (hezmê) hêsan dike, ji bo daxistina şekirê nava xwînê dibe alîkar. Pirteqal ji bo nexweşên şekir hem wezîfa qût (xwarin û xida) hem jî ya dermanbûnê dike.